



# TÊ KOSER



HEJMAR 37

ÎLON 1987



**TEKOŞER:** KOVARA TEKOŞER, YEKİTİYA KARKER Û XWENDEKAREN KURD LI BELÇTKA**NAVİŞAN:** rue BONNEELS, 4 - 1030 BRUXELLES - BELGIQUE**TEL:** 02/230.89.30**NAVİŞANA POSTE:** B.P. 33 - 1730 ZELLIK - BELGIQUE**BÜHA:** 50 F.B.**Nº BANKE:** 426-3144071-85 - K.B. - BELGIQUE**BERPIRSIYAR:** M. Nezih YALÇIN**KOMİTA NIVISKARIYE:** Ahmed, Derwêş, Pervîn, Yalçin

## N A V E R O K

CIVİNEKE ÇAPÈ LI SER KURDISTANE .....	Pervîn .....	R. 3
RÈZIMANA KURDİ (X), ZAYEND Û JIMARNAV .....	CELADET BEDIR XAN û Roger LESCOT...	R. 4
HELBESTEN XWENDEVANAN .....	Sebrî BOTANI, Ahmed .....	R. 9
SE KURTEÇIROK .....	Şahînê B. SOREKLÎ, Amed .....	R.10
DİROKA KURDISTANE DI ANSİKLOPEDIYA ISLAME DE (X), CIVAKA KURDÎ .....	.....	R.14
EZİDİ Û ZERDEŞTİ .....	TORÎ .....	R.19
WEŞANEN TEKOŞER .....	.....	R.21
WENEYEN ZAROKAN .....	.....	R.24
XEBATA ME .....	.....	R.26

## S O M M A I R E

CONFERENCE DE PRESSE SUR LE KURDISTAN .....	Pervîn .....	P. 3
GRAMMAIRE KURDE (X), LE GENRE ET LE NOMBRE .....	Celadet BEDIR XAN et R. LESCOT	P. 4
POEMES DES LECTEURS .....	Sebrî BOTANI, Ahmed .....	P. 9
TROIS CONTES .....	Şahînê B. SOREKLÎ, Amed .....	P.10
L'HISTOIRE DU KURDISTAN DANS L'ENCYCLOPEDIE DE L'ISLAM (X), LA SOCIETE KURDE ....	.....	P.14
LES YEZIDIS ET LE ZOROASTRISME .....	TORÎ .....	P.19
PUBLICATIONS DE TEKOŞER .....	.....	P.21
DESSINS D'ENFANTS .....	.....	P.24
NOS ACTIVITES TRIMESTRIELLES .....	.....	P.26

## I N H O U D

PERSCONFERENTIE OVER KOERDISTAN .....	Pervîn .....	P. 3
KOERDISCHE GRAMMATICA (X), GESLACHT EN GETAL ...	Celadet BEDIR XAN en R. LESCOT..	P. 4
GEDICHTEN VAN LEZERS .....	Sebrî BOTANI, Ahmed .....	P. 9
KORTE VERHALEN (3) .....	Şahînê B. SOREKLÎ, Amed .....	P.10
DE GESCHIEDENIS VAN KOERDISTAN IN DE ISLAMITISCHE ENCYCLOPEDIE (X), DE KOERDISCHE MAATSCHAPPIJ ....	.....	P.14
DE YEZIDI EN HET ZOROASTRISME .....	TORÎ .....	P.19
PUBLIKATIES VAN TEKOŞER .....	.....	P.21
TEKENINGEN VAN KINDEREN .....	.....	P.24
ONZE ACTIVITEITEN .....	.....	P.26

# CİVİNEKE ÇAPÊ Lİ SER KURDISTANÊ

Pervîn

Bi hinceta (munasebet) hovîtiya hikûmeta Iraqê li Kurdistana Iraqê, Lîga Navnetewî ya Parastina Maf û Rizgariya Gelan û sê komelên kurd: Têkoşer, K.S.S.E. (liqê Belçika) û Y.X.L.K.E. (liqê Belçika), di mîjuya (tarîx) 1.7.1987 de, li I.P.C. (International Press Centre) li Bruxelles, civîneke çapê pêk anî.

Di destpêkê de, Profesor François Rigaux serokê Lîgê, pêşgotinekê bi fransizî û hollandî çêkir û tê de, weka ku emê li jêr bibînin, li ser rews û mafêñ gelê kurd bi awakî giştî û bingehî peyivî. Paşê, her du nûnerên K.S.S.E. û Y.X.L.K.E. li ser kirinêñ hov ên hikûmeta Iraqê baş rawestîyan (li hejmar 26, rûpel 6 binêre) û alîkarî ji rêxistinêñ belçîkî û navnetewî xwest. Di dawiyê de, me bersivêñ rojnamevan û besdaran dan. Ji alîkî din jî, me dosyekê bi fransizî û hollandî pêşkesî wan kir. Rêxistinêñ belçîkî yên giring piştgiriya me kir û soz da ku alîkariya me bikin.

Em li vê derê pêşgotina Prof. Rigaux bi kurtî werdigerînin kurdî:

"EZ xweşhatinê ji rojnamevanêñ ku vexwendina (dawetiye) besdarbûna vê civîna çapê li ser pirsa Kurdistanê pejirand (qebûl kir) hêvî dikim.

Bikaranîna (istimal) vê gotinê bixwe, Kurdistan, ji bo hinan gelek bigotûbêj tê yan ewê bê dîtin, ji bo ku gelê kurd ku ji hindikayî ve di nav pênc dewletan de perçekirî ye ji gelek sedsalan li ser zewiyekî (erd) dîrokî rûniştiye. Ev zewiyê dîrokî ku iro bi awakî sunî bi sînorêñ ku

encama (netîce) rewşa ku meriv divê navê wê bike "çara mêtîngîhî" ku ji parkirina imperatoriya osmanî re piştî 1918 hat dîtin, hatiye vegetandin. Ev zewî, min got, karî bû bi awakî rîkûpêk (mukemmell) di wê dema netewahîyan (cinsiyet) de, piştî 1918, dewleteke nuh, dewleteke ji aliye coxrafi û dîrokî bicarek wekhev ava bike, lê ew bi awakî pirr sunî hat perçe kirin. Loma gotina Kurdistan, ku rastûrast rîzayê (mana) vê ramana (fikr) zewiyekî û urf û adetên kurdî di nav sînorêñ dîrokî de dide. bi mebestî (bi qesdî) hatiye avêtin, bi hêzanî li welatêñ ku tê de fro gelêñ ku weka hindikayî têñ dîtin - weka Kurdan - hene. Li hin welatêñ din, bi hêzanî li Tirkîyê, heta hebûna hindikayîyeke kurdî jî nayê pejirandin. Hûn dizanin ku li Tirkîyê Kurd bi awakî fermî (resmî) "Tirkêñ çiyayî" têñ bi nav kirin, ji bo ku tu bîr (fikr) li ser ramana gelê kurd bixwe nemîne.

Ji min hat xwestin ku ez serokatiya vê civînê bikim û ez wê bi dilxwesi dikim, ji bo ku ji nêzîki deh salan ez di Rêxistina Navnetewî "Lelio Basso" ji bo Maf û Rizgariya Gelan de xebatê dikim. Me, di 1976 de, ango berê hinek ji deh salan bêtir, li Cezair Daxuyaniya Navnetewî ya Gelan dest nîşan da (tesbit kir). Ev daxuyanî rastûrast tecrube dike ku ramaneke ku ji bo me bingehî ye, ya gelan, têxe nav cihana dewletan. EZ bawer dikim ku eger di nav pirr rewşen pelixandina mafêñ gelan li cihana froyn de rewşek hebe ku divê bala me bi awakî taybetî (xusûsî) bikişîne, ew bê gûman a gelê kurd e.

## Déclaration Universelle des Droits des Peuples



Alger juillet 1976

LIGUE INTERNATIONALE POUR LA DEFENSE DES DROITS DES PEUPLES  
CONFERENCE DE PRESSE A L'I.P.C.: LA SITUATION ACTUELLE AU KURDISTAN  
Intervention du Prof. F. RIGAUX

Je souhaite la bienvenue aux journalistes qui ont bien voulu accepter l'invitation de participer à cette conférence de presse sur le problème du Kurdistan. Déjà l'utilisation de ce mot, Kurdistan, est ou sera peut-être jugé par certains profondément polémique. En effet, le peuple kurde, dont la population est répartie sur au moins cinq états différents, occupe un territoire historique depuis de nombreux siècles, territoire historique qui est aujourd'hui artificiellement divisé par des frontières qui sont issues de ce qu'il faut bien appeler une solution coloniale donnée au partage de l'empire ottoman après 1918. Ce territoire, dis-je, aurait pu parfaitement constituer à cette époque des nationalités, après 1918, un état nouveau, un état parfaitement homogène, géographiquement, historiquement, mais qui a été, d'une façon tout à fait artificielle, découpé. Et alors le mot Kurdistan, qui précisément se réfère à cette idée d'un territoire, d'une tradition kurde dans les limites des frontières historiques, est soigneusement banni, notamment dans les pays qui connaissent aujourd'hui ce que certains reconnaissent être des minorités, Kurdes surtout. Certains autres, et c'est le cas notamment de la Turquie, ne reconnaissent même pas l'existence d'une minorité kurde. Vous savez qu'en Turquie l'expression officielle est d'appeler les Kurdes "les Turcs de montagne", précisément afin de bannir toute référence quelconque à la notion-même du peuple kurde.

On m'a demandé de présider cette conférence de presse et je le fais très volontiers parce que depuis une quinzaine d'années je m'occupe de la Fondation Internationale Lelio Basso pour le Droit et la Libération des Peuples. Nous avons, en 1976, il y a donc un peu plus de 10 ans, adopté à Alger la Déclaration Universelle des Peuples. Cette Déclaration tente précisément d'introduire dans l'univers purement étatique un concept qui nous paraît fondamental, c'est celui des peuples. Et je crois que si, parmi de nombreuses situations de violation des droits des peuples dans le monde contemporain, il y en a une qui doit particulièrement attirer notre attention, c'est certainement celle du peuple kurde.

# RÊZİMANA KURDİ

(Zaravê Kurmancî)

- X -

Mîr Celadet BEDIR XAN û R. LESCOT (\*)

Besa duyemîn

MORFOLOJİ (1)

## 1. C E L E B È N RÊZIMANI

Z A Y E N D Û J I M A R N A V

88. Regezên (unsur) cihê yên takaneya (2) kurdî di du tofêن (kom, grûp) pirr cihê de bes dibin:

### a) Gotinêñ guhêrbar


Ev gotinêñ ku dikarin parek, pêşkereke awayî yan pêşkereke kesîn bistînin. Di vê tofê de, nav û hemî gotinêñ ku weka nav bi kar tê, piraniya pronavan (zemîr), piraniya rengdêrên (sifet) pêşker, pirskevî û nebinavkirî, lêker dikevin.

### b) Gotinêñ neguhêrbar

Ev gotinêñ ku nikarin ne parek, ne tu celebeke pêşker, weka rengdêrên çilobûn û çawabûnê (eger ew weka nav bi kar neyîn), hin rengdêrên pirskevî û nebinavkirî, hoker (zarf) û gotinêñ ku cihê wan digirin, hin pronav, daçek (li, ji ....), gihanek (û, an ....) û hwd. bistînin.

89. Kurdî du zayandan (cins), nêr û mî, û du jimarnavan, yekejmar û gelejmar, nas dike. Cihêkirina zayend û jimarnavan ji bo her gotineke ku weka nav bi kar tê û ji bo piraniya pronav û rengdêrên ku dikevin nav tofa gotinêñ guhêrbar çêdibe (bend 88-a). Kesandina lêkeran li gora kesan û jimaran, ne li gora zayend, çêdibe.

Her ku gotinek di rewşa mutlaq de (bê guhertin) bimîne (li bend 98, nîşank I binêre), tutiştî teşeya (şikl, awa) wê de, ji destpêkê, wê weka nêr yan mî, yekejmar yan gelejmar nîşan nade. Meriv nikare zayenda wê nas bike heta ku ew parekekê yan pêşkereke awayî nestîne. Ji aliyê xwe, jimarnav xuya nabe heta ku parekek, pêşkereke awayî ya yekejmar yan gelejmar (awayî têrkerî yan bangkirinê) tu nebe, yan ji heta ku pevhatina gotina netewandî bi lêkereke yekejmar yan gelejmar re nebe (li bend 97 binêre).



(\*) Grammaire Kurde, Librairie d'Amérique et d'Orient, Paris 1970. Wergerandin, fransizî-kurdî: Pervîn.

(1) Morfolojî: Lêhûrnêrîna teşeya (şikl, awa) gotinan yan tofêñ (kom, grûp) gotinan.

(2) Takane: Tevayıya gotinêñ zimanekî.

Rêzkirina navan di van her du zayendande li gora zagonê (qanûn) giştî diçe. Ev zagon bê ku rêzikên (qaïde) mutlaq ava bikin, divêñ bêñ lêhûrnêrîn. Em bi rêz li

zayenda gotinêñ ku kesêñ jîndar û ya gotinêñ ku ji bo tiştêñ nejîndar yan ramanêñ nenêrbarî (fikrêñ mecazî) bi kar têñ hûr binêrin.

## Z A Y E N D

### 90. Zayenda gotinêñ ku kesêñ jîndar nîşan didin

Hemî nav û serenavêñ (navêñ kesan: Soro, Bêrîvan....) ku kes û lawirêñ (heywan) nêr nîşan didin nêr in.

Nîşe: Mirov, bav, cotkar, rîspî, hesp, beran, nêrî, Soro.

Bi eynî awayî, hemî nav û serenavêñ ku kesêñ mî nîşan didin mî e.

Nîşe: Jin, dê, kebanî, çêlek, mehîn, mî, bizin, Rewşen.

**Nîşank.** Li ser zayenda serenavan, li dûrtir jî, bend 117, nîşank II binêre. Em ji nuha bîr bikin (bifikirin) ku hin navêñ ku rezayê (mana) wan nêrbarî (konkrêt) ye dikarin di eynî zemanî de weka serenavêñ nêr û mî bi kar bêñ. Wê çaxê, ew, bi awakî giştî, zayenda ku li bikaranîna wan a nuh tê distînin.

Nîşe: Baran, Keser, Şêr, Xem weka serenavêñ mîr û jîn, ku zayenda ku li wan tê distînin, bi kar têñ.

91. Weka ku hin nîşeyêñ benda buhuri nîşan didin, hin lawirêñ kedî (heywanêñ malî) yêñ eynî celebî navêñ wan ên cihê, li gora ku ew nêr yan mî bin, hene. Li gel vê qasê, piraniya lawiran, kedî û hov, bitenê navekî wan ê celebî, bê cihêkirina cinsî, heye. Wê gavê, ev gotin zayenda xwe ya taybetî (xusûsî) distîne.

Nîşe: Rovî (nêr), şêr (nêr), hirç (mî), qijik (mî).

Eger em bixwazin cinsê lawir dest nîşan bidin (tesbit bikin), em piştî navê celebê wî rengdêra nêr yan mî datînin.

Nîşe: Ker (nêr): kerê nêr, kera mî.


Hirç (mî): hirçê nêr, hirça mî.

Kew (nêr): kewê nêr, kewa mî.

Kêvroşk (nêr): kêvroşkê nêr, kêvroşka mî.

Carna dibe ku rengdêra ku cinsê lawir nîşan dide, lê bitenê ji bo celebêñ ku gelek caran têñ gotin, weka pêşdaniya gotina celeb bi kar bê, û bi vî awayî gotineke hevedudanî çêdike.

Nîşe: Nêreker (kerê nêr), maker (kera mî). Nêrekew (kewê nêr), mîkew (kewa mî) (marî ji tê gotin). Mange "çêlek" (mî). Dêlegur "gura mî" (mî).



Em bala xwe bidin ku gotina "dêl" (di dêlegur de), di rata "cihê" tenha de, mîya her lawirekî ji celebê sehan (küçik) nîşan dide. Bi eynî awayî, "mak" yan "mang" (di maker û mange de) di rezayê "dê" de tê.

Meriv nikare cihêtiya cinsî bi ragihan-dina parek yan pêşkera awayî ya zayenda ku em dixwazin bi gotina celebî çêke, eger ev gotin avakirî be.

Nîşe: Ez li hespî (nêr) siwar bûm.

Ez li hespê (mî) siwar bûm.

Siwarê kerê ne tu siwar e (pêşgotî).

Di vê nîşeya dawîn de, eger me bixwesta ku em kerê nêr bêjin, meyê bigota "kerî".

**Nîşank.** Di babeta gotinêñ ku kesêñ jîndar ku zayenda wan dikare biguhere de, li bend 95-a binêre.

### 92. Zayenda gotinêñ ku tiştêñ ne jîndar nîşan didin

Sedema vegetandina gotinêñ vî celebî di her du zayendan de, bi awakî giştî, teşe yan damezrana (bi tirkî: yapı) tiştêñ ku têñ nîşan dan yan ramanêñ ku têñ pêşan dan,

weka ku lîsteyêñ jêrîn ewê wan nîşan bidin, e. Em dest nîşan didin ku rêzkirina ku me tecrube kir nikare xwe mutlaq iddia bike. Bikêrhatina wê bitenê ji bo dayîna nîşanêñ giştî ye. Em di bîra xwe de bihêlin ku gotinêñ mî ji yên nîr gelek bêtir in.

### 93. Gotinêñ nîr

- 1) Ji sedema wekheviya wan a rast, piraniya gotinêñ ku tiştên nîrbarî yên tûj yan bilind nîşan didin. Lê ev rêzik gelek istisnayêñ wê hene.
- 2) Navêñ jimaran, ji derveyî (xeynî) "yek".
- 3) Gotin û serenavêñ ku herikîna avê nîşan didin.
- 4) Navêñ maddeyêñ xam û madenan.
- 5) Navêñ rengêñ ku weka nav (ne sifet) bi kar têñ.
- 6) Piraniya gotinêñ ku maddeyêñ ku lawirêñ kedî didin (çêlek, mî, bixin), û hemî gotinêñ ku maddeyêñ şîrî nîşan didin. Bi awakî istisnaî, "hirî", "lîva" (hi-riya zirav) û "lorik" (şîrê tirşbûyî) mî ne.

### 94. Gotinêñ mî

- 1) Ji sedema wekheviya wan weka ya jorîn (bend 93-1), piraniya gotinêñ ku tiştên hûr, qulkirî yan pan nîşan didin. Bi vî awayî, "zinar" nîr e, lê "lat" û "ferş" (zinarê pan) mî ne.
- 2) Gotinêñ ku cihêñ rûniştinê nîşan didin. Istisna: Kon, xanî, axur, stewl (xaniyê hespan) nîr in.
- 3) En ku gengaziyêñ (wasite) rêveçûnê (erebe, trêñ...) nîşan didin. Heta nuha tu istisna ne hatiye dîtin.
- 4) Serenavêñ coxrafî (êñ bajar, welat, çiya û hwd.). Istisna: Navêñ çeman (li bend 93-3 binêre).
- 5) Gotinêñ ku hertiştê ku di ezman de ye, yan ku jê dikeve, û yên ku piraniya diyarbûneyêñ (hadisêñ tebîî) hewayî nîşan didin. Lê "ezman" bixwe û "ba" nîr in.
- 6) Piraniya gotinêñ kû zeman û beşbûnêñ wî nîşan didin. Lê hin ji wan di hin zara van de nîr in (li bend 95-d binêre).
- 7) Navêñ nexwesiî, êş û birînan.
- 8) Navêñ xwarinêñ pijiyayî, ji derveyî "nan" û wekhevêñ wî, û "goşt".
- 9) Destgehêñ (alet) müsîqî û yên buroyan.
- 10) Navêñ çekan. Heta nuha tu istisna di takaneya çekêñ biagir de ne hatiye dîtin. Lê, navêñ van çekêñ bêagir nîr in: Şûr, hiwêzî (gurz), şesperî (komeke çek), doqik (çekê ku pê serê meriv tê şikandin), bivir, tevirzîn (bivirê bi du alî).

# KURDISCHE GRAMMATIK

VON

Ferdinand Justi.

Sändig Reprint Verlag  
Hans R Wohlwend  
Schaan/Liechtenstein

11) Bi awakî giştî, hemî gotinêñ ku meriv nikare bi awakî mantiqî ji wan re zayendekê bide, lê ku weka nav bi kar têñ: Navêñ tîpêñ alfabê, hoker, prona-vêñ ku weka yên bêzayend ên hin ziman an in (bi fransizî: neutre), û hwd.

12) Bê istisna, hemî gotinêñ nenîrbarî ku bi ragihandina gotineke rayî (eslî) bi paşdaniyeke bi "î" têñ ava kirin.

Nîşe: Mezinahî, spehîtî, dirêjahî, mîranî, camîrî, xizanî.

Nîşank: Dema ku rêzayê wan ê nîrbarî heye, navêñ bi "-î" dikarin nîr bin (li bend 81 binêre).

Nîse: Beleki (nîr): lekeke berf.  
Belekahî (mî): sipî û res bûn.  
Karwanvanî (nîr): merivê ku karwanekê dikişîne.  
Karwanvanî (mî): di karwanekê de bûn

13) Hemî raderêñ (mesder) ku weka nav bi kar têñ: Nalîn, mirin, dayîn, jîn, xwarin.

### 95. Gotinêñ ku zayenda wan diguhere

Ji derveyî yên ku li jor hatin nîşan dan (bend 91), emê nuha lîsteyâ gotinêñ ku zayenda wan diguhere, yan ku dikarin ji bo zayendeke din bi kar bêñ, bidin:

a) Hin gotinêñ ku bi awakî giştî nîr in, ku dikarin bibin mî, eger kesê ku ew nîşan didin jin be.

Nîşe: Heval (nîr): hevala min (mî).

Dijmin (nîr): dijmina min (mî).

Dost (nîr): dosta min (mî).

Cîran (nêr): cîrana min (mê).

Mîr (nêr): mîra Botan (mê).

**NİŞANK:** Hin gotinênu ku bi rêzayê nenêrbanî di formulên edeb û terbiyê de bi kar tênu û ku dikarin ji bo her du cinsan bi kar bênen (weka qurban "mê", heyran "mê", semyan "hazret: mê", gorî "mê") tucar zayenda xwe naguherînin.

b) Rengdêrên ku weka nav bi kar tênu û dema ku nêrekî nîşan didin nêr in û dema ku mîyekekî nîşan didin mê ne, weka "delal", dikarin her du zayendan bistînin.

Nîşe: Delala min, delalê min.

c) Hin gotinênu ku zayenda wan bi guhertina rêzayê (mana) wan diguhere.

Nîşe: Mal (mê): xanî.

Mal (nêr): hebûn, milk.

Ben (mê): erdê çandinê yê bilind.

Ben (nêr): benê girêdanê.

Savar (nêr): ê xav.

Savar (mê): a pijiyayî (li bend 94-8 binêre).

Dar (mê): a ku hatiye çandin.

Dar (nêr): ê jêkirî.

Navênu bi "-î" (li bend 94, nîşank binêre).

d) Gotinênu ku di hin peyvikan de (bi awakî giştî li Rojhilatê) nêr in û di hinênu din de (bi awakî giştî li Rojavayê) mîne. Lî, zayenda wan di hundirê peyvîkê bixwe de tucar naguhere. En giringtirîn ev in:

Çax, wext, qeder û mixdar, sîng, kursî, balgîh, xeber, tişt.

#### 96. Zayenda gotinênu hevedudanî û yêni biyanî

Gotinênu hevedudanî ku ji du gotinênu ku zayendanî wan cihê ne ava bûne zayenda ku li tişt yan kesê ku nîşan dide tê distînin.

Nîşe: Dotmam (mê): dot (keç) û mam (ap).

Qelemezirêc (mê): qelel (mê) û zirêc (risas) (nêr).

Bi eynî awayî, gotinênu biyanî ku ketine nav kurdî zayenda ku mantiqê ku ev ziman dixwaze distînin.

Nîşe: Hemam (mê) (bi erebî nêr e).

Şimendifer (mê) (bi fransizî nêr e).

Trên (mê) (bi fransizî nêr e).

## J I M A R N A V

97. Kurdi du jimarnavan cihê dike, yekejmar û gelejmar. Bi rêzika giştî, dema ku gotinek di rewşa mutlaq de dimîne, meriv ji destpêkê qet nizane kîjan ji her du jimarnavan bi kar hatiye.

1) Ji bo navan, jimarnav di van rewşan de xuya dibe:

a) Dema ku nav di rewşa mutlaq de (bê guhertin) dimînin (li bend 98 binêre) jimarnav bi pevhatina lêker (li bend 184 binêre) xuya dibin.

Nîşe: Mirov hat. Mirov hatin.

Min mirov kuş. Min mirov kuştin.

b) Gava ku nav bi parekekê tênu ragihan-din, jimarnav bi teşeya vê parekê xuya dibin.

Nîşe: Mirovê xurt. Mirovên xurt.

c) Jimarnav bi pêşkerên awayî yêni cihê xuya dibin.

Nîşe: Ez mirovî dibînim.


Ez mirovan dibînim.

Lo mirovo.

Geli mirovan.

2) Hin pronavênu kesîn teşeyen wan ên cihê ji bo yekejmar û gelejmar hene.

Nîşe: Ez, tu, em, hon (hûn).



Lê piraniya pronavan, gava ku di rewşa mutlaq de bin, eynî teşe ji bo her du jimarnavan dihêlin. Meriv di rewşen jérin de dizane ku ew yekejmar yan gelejmar in:

a) Bi pevhatina lêker.

Nîše: Ew hat. Ew hatin.

b) Bi hebûna tewandinên awayî.

Nîše: Ez wî dibînim. Ez wan dibînim.

Di dawiyê de, hin pronav bitenê bi awayê yek ji her du jimarnavan bi kar têñ. Bi vî awayî, pronavê hevdudîtiyê, "hev", hergav gelejmar e, lê pronavê pirsîyarî "çi" hergav yekejmar dimîne.

3) Jimarnava rengdêran, eger ew guhêrbar yan neguhêrbar bin, bi pevhatina navê ku ew girêdayî wî ne xuya dibe.

Nîše: Ev mirov hat.

Ez van mirovan dibînim.

Mirovekî xurt.

Mirovine xurt.

4) Lêker pêşkerên kesîn ku li gora rêzika pevhatinê diçin distînin.

Nîše: Ez hatim. Em hatin.

NîŞANK. Gava ku emê li tewandin, pronav, rengdêr û lêkeran hûr binêrin, emê bi hûrî (bi tefsîl) li ser rêzikên pevhatinê vegeerin.

Pêşgotî: Dinya gulek e, bihin bike û wê bide hevalê xwe.

Dûmahî heye

B. NIKITINE

Où en est la Kurdologie?

Extracto dagli "Annali" del R. Istituto Superiore Orientale di Napoli  
Volume IX - Dicembre 1936 - XV

S.I.R.O. - STABILIMENTO INDUSTRIE EDITORIALI MEDITERRANEO - NAPOLI  
Via S. Giovanni Maggiore Pighetti, 2 - Telefono 24566

LONDON ORIENTAL SERIES · VOLUME 9

# KURDISH DIALECT STUDIES

I

BY

D. N. MACKENZIE

Y.39373 OOL OF ORIENTAL AND  
AFRICAN STUDIES

# HELBESTÊN XWENDEVANAN

## Soz bit

Sebrî BOTANI

Ji devê M. GÜNEY

Soz bit! Sozê ne şkînim!  
Her bimînim rastperwer!  
Ger leşê min seranser  
pirt-pirt bikin bi xencer!  
Evîndarê gulê me  
bi can û bîr û bawer!  
Jana evîna gulê  
girtiye can û ceger  
Şox û şepal e gulê  
Wan û Lacan û Pişder  
Mistek ji axa gulê  
na dim bi barek gewher!  
Camek ji ava gulê  
na dim bi gula kewser!  
Teng û tarî dibînim,  
ev êş derd û keder  
Madem ji bo gulê ye  
şîrîn e mîna şeker!  
Ji mêj ve min hildaye  
ev diroşmî sor û zer  
Wek heval û hogiran  
her dimînim derbeder!  
Peyman didim her û her!  
Ango ji rê ne çim der!  
Rast rawestim li hember!  
Heta di nav me mabin  
Xwefiroş û dagîrker!

## Lider

Ahmed

Şev hat  
Zû zû reş ket,  
Dîse bi gazinc  
Bi derd û kul  
    Û qolinc  
Mi bixêrhatin  
    Da şevê;  
  
Dil diteqê,  
Mêjî difurê,  
Xwîn servediqê,  
Betnêmî biçük dimînê  
Û dîse dikişinê dil:  
    Sebir û hisretê  
    Vê şevê ...

Çavê min li ezman dikevê  
Stêrikek ges̄ dibê,  
    Ges̄ dibê  
Diçirisinê  
    Di çavê mi de  
Keyalê min zêde dibin,  
    Zêde dibin;  
Kêfxwes̄ dibim  
    Vê kelikê  
Lê bi xwe dihisim:  
Dîse dûrî welat  
    Û bê kesim işev jî;

Bi derdê ne kembûyû,  
Barkirî bi gazinca,  
Qehrê hê kûrbûyi,  
Ji dê-bav û welat  
    Bi hisret mayî  
Dîse şevê  
Bi ser mi de girt!..

# Sİ KURTEÇİROK

## H İ V İ

Şahînê B. SOREKLÎ

Etar kete gund û li şûnbêderan, hevsar di dest de û kera du sandiq rakirî li dû, bang kir: "Evîn ha! Evîn ha! Evîna şérîn heye, mizgîna dilan heye!". Ü gundi li dora etêr civiyan, ji wî pirsîn û qîriyan: "Çi heye bi te re, etaro? Raber ke, te îroj çi haniye!". Ü etêr bersîva gundaiyan da, gotina berê ducar kir: "Evîna şérîn heye, mizgîna dilan heye". Ü pîran ji hêlekê de, zarokan ji ya din de; hinan bi çavan, yên din bi lepan sandiqên etêr velo kirin, serên xwe leqandin û şora etêr bawer ne kirin. Gundıyan li çavên hev niherîn, bi dilên sar paş ve kişiyan û etar di şûnê de hîştin, ew û kerê û sandiqên evînê.

"Evîn ha! Evîn ha!". Etêr dîsa bang kir, lê çi kir û çi ne kir, dengê wî kesek hişarı xwe ne kir. Etêr dîsa dil sar ne kir, destek da kêleka rûyê xwe û cardin bang kir: "Gundîno, werin, werine evînê! Li şûna şekirê kulorîn, xurmeyîn kurmî û morikîn camîn îroj min evîn bo we hanî û ez wê bi dravan nafroşim, ne dixwazim ceh û genim, ez wê bo we diyarî dikim". Lê dîsa bê kelk, kesek li etêr xwedî derneket. Ü li ezmînî ewrîn dagirtî civiyan, bûn yek û ji wan berf bariya jêr û drêj nekir qefilî bedena etêr, lê gundaiyan deriyêن xwe di rûyê wî de girtin û girtî hîştin û kuste-pista wan dihat, digotin: "Dîn bûye etarê bêçare, dîn! Ma çawa di sandiqên wî de hebe evîn?!".

Etêr gund li dû xwe hîşt, li bajîr ziviriya, lê ber têkevê dageriya merzelê wê û barê kera xwe li ser gorekê vala kir. Ü bi rohilata roja li pêş re, kerê xwe da pê xwe, bir mezata bajîr û arzan frot. Ji wê rojê û şûn ve etêr etarî li şûn hîşt û li nav taxêن bajîr digeriya. Hin caran di qucikekî de pişta xwe dida dîwîr û bi seetan deng jê ne dihat der, xemgîn û dilşîn bayê sar di bêvlan re dikîsand û di devê xwe re germ berdida û yekcaran jî dimeşîya, bang dikir û diqîriya, gazinc dikir ji merovan, yên ku bi bêjeyêن froşen xurmeyîn kurmî bawer dikan û têyêن xapan-din, lê guh nadin dengê evînfroşekî dil-brîn.

Rojekê ji rojêñ biharê etar çû nav merzelê bajîr û li şûna wî li ser evîn rijandî geriya. Bi nişka ve çavên wî li gorekê ketin, ku li ser kulîlkeke sor rabûbû dîlanê, xwe li badikir û dilê etêr xwe bi dîtina gulê, bi şewqa roya nîsanê û bayê honik pirr şâ kir û etar ber bi gorê beziya û kulîlka evîna xwe nas kir, ew kire navbera herdu lepêñ xwe û çel û çar caran paç kir, lê hilnekişand, ne ew qurçifand, ne jî jêkir.

Ji wê rojê û pê ve nema etar êdî giriya, ne jî ji qehra dilê xwe qîriya, ji lewra kesek mirî evîna wî kirî û guleke sor ji ber ve da wî. Etêr bi xwe re got: "Ez ê bijîm, ez ê bijîm; hê heye bo min hêvî, hê heye hêvî!".

Rojeke destpêka gulanê etar çû ser gorê û dît, ku gulek bûye duduyan; yek hebki çilmisiye, ya din hê li ser xwe ye û etêr ya tî, bê ku biêşîne, jêkir, av bi ser de reşand û di ber pêşîra xwe re kir. Du zarokêñ biçük ew bi rê ve dîtin, rojbaşî li wî dan û li ber geriyan, ku ew wê kulîlkê bide wan û etêr gula xwe pêşkêşî wan kir û hersê bi hev re kenîyan, kenîyan û kenîyan û etêr bang kir, herdu mindalan lê vegerandin: "Evîn hê, evîna dilan! Kul û xeman dide hêlekê û şahîyê dike dilan!". Ü etar bi rê ket, desmal di destekî de, destek jî li ser sérî, bi stran û dîlan domand rêya xwe. Hê hebû hêvî, hê hebû hêvî, hê hebû hêvî!

(IV-87)



# MİRİNA XEZALEKÎ

Şahînê B. SOREKLÎ

Bihar e, ro di kûraniya ezmên de pesna xwe didêye, şax û newal bi rengên cuda xemiline, sapê gênim û cê li binê çongan e û hilma bayê honik bi bîna kulîlk û gîhayê Kurdistanê avis bûye.

Li paş gund keçekte gundî li ber şes-heft berxan e, bi çögikê xwe pîvok û kerengan li vir û wir ji erdê dixe der. Navê keçê Sosin e, ya ku ji panzdan dihere şanzdan e: Bejina wê wek şitla dareke sêvê ye; çavên wê reşbelek in, wek yên xezalan in; lêvên wê sor in, di rengê gulê de ne; memikên wê guloberin, ne biçûk û ne mezin in, lê wek du henarên bajarê Riha ne; gulyîn wê res-moravîn in, li navê ne û di hindir dîlê wê de hêlûna şahiyê xwe bi cih kiriye; Sosin stiraneke evînê pêşkêşî kewik û çivîkan dikê ye, bo dengê wê û wan bibin yek û goraniya rindî û xwesiyê bidin rojeke ji yên biharê. Ger bejin û balava wê ne wek ya nijada merovan bûya, te ê bigota, ev denga bê guman yê pêriyan e.

Ji hêla gund qilafetek xwe dilivîne û hêdî hêdî nêzikiyê li Sosinê dike. Cawa merov bi nêzikbûna xwe dawiyê dide xwendina bulbilan, wisa jî nêzikiya xort dawiyê dide stirana Sosinê. "Dema te bi xêr be, Sosinê" dibêje xort, lê keçik li wî venagerîne. "Ez bi heyrane bejina te ya zirav bim, çelenga min. Ma haya te jê tune, ku dilê min ketiye te?! Ne ez êdî hiliyam". Dilê Sosinê dike gupe-gup û xwûna tamarêne wê germ û beza dike; rûyê wê sor dibe, devê wê dikeve hev û ziman tê de lal dibe. Xort xwe digihîne wê, wek lawireki hov bi çepelênen wê digire, kaşe nav şitlîn gênim dike û li ser piştê davêje ser wan. Sosin ber xwe dide na de, lê ne dikare xwe ji lepêñ wî azad ke. Ezman dest pê dike li ber çavên wê pîlik pîlik bibe û dirêj nake, dest û lingên wê ji hêzê vala dibin. Pê dema ciğare-vexwarinekê xort radibe ser xwe û berê xwe dide çolê. Sosin li ser sapen şikeşti û xar ramediyayî dimîne; ew, çilikênen xwûna wê û hêstirêne herdu çavan.

\* \* \*

Çar meh derbas dibin, dema Sosin rojekê ji dayika xwe re dibêje: "Anê, bila Keko min bikuje". Dayik di şûna xwe de hişk dibe û çav di sêri de diseokin: "Wuşşş, ev çi gotin e, qîzê; ev çi zibil-belav-kirin e?!" Keçik çavên xwe berdide erdê, dev li hev

digere, lê ji dest tê der bibêje: "Yadê, min namûsa me di erdê da, ez bi du cana me" Sosin ne dixwaze û ne dikare ji van bêjeyan bêtir ji xwe derxe. "Hawar! Xwelî li serê min rebena Xwedê be...", dibêje dayik û hê gotina xwe kuta ne kiriye qîrîneke ne ji vê dunê ji wê tê der, dikeve xar, dikerbile. Sosin hê dixwaze tasek av wîne û rûyê dayka xwe şil bike, dema bavê wê xwe digihîne hindir û bi gihîştina wî re keç dibeze der, berxan dide pêş xwe û berê xwe dide çolê.

Du-sê seet derbas dibin, belkî bêtir. Sosin li ew roja, ku têde çîlikên xwûnê li ser zadê kesk nuqitîn vedigere û bi nişka ve li wê eyan dibe, çawa ew dike bibe qurbanek bê amanc. Dilê wê, wek yê xezaleke nexwes, hema bi zor xwûnê li tamaran belav dike.

\* \* \*

Ro li nîvê ezmên e, ba wenda bûye, berx diçerîne û şivana wan jî li ber wan di bêhêvîmayina xwe de hiliyaye. Birayê Sosinê yê çarde salîn xwe digihîne xûşka xwe. Ji hêlekê de dixwaze wê hilgetîne û xwûna wê vexwe, lê li milê din agir ketiye hindirê wî, çiku ew ji xûşka xwe zehf hez dike. Çar çav li hev mîze dîkin û barana hêstiran dibarînin. Sosin xwe dide hev û dipeyive: "Bira, ez bi qurban! Şerm e merd bigirîn. Hêsrên xwe damale û guh bide xweyînga xwe. Min şeref û namûsa malbat û eşîra me kir tev xweliya reş. Tu wê dabençê bide tengâ min rebenê û metirse. Ez ji te naşeyidim. Heyfa camêran bra! Ji yadê re bibêj', bila nan û xwê helal ke; bila bavo jî min af ke; di qedera min de wanî hatiye nivîsandin".

Qurşîn diteqe; Sosin, wek xezala brîn, li ser sapê gewr dikeve; ro li jor şerm dike; xuda stûyê xwe wek bêçaran xar dike; şeytan tiliyêne xwe dike guhêne xwe û direvê; çivîk ji hêlûnan difirin; kêzik xwe di bin herriyê de vedişerin; kaş û newal dengê dabençê paş ve vedigerînin; brayê Sosinê diqîre û dibeze, bê ku bizanibe ku de; û Sosina Kurd bi tenê dimîne, di nav golek xwûna sor û germ de. Di mirinê de jî lêvên wê yên delal kenekî şérîn pêşkêşî hebûnê dikin.

Ji dilek xemgîn,  
bo Sosinê gelê min pêşkêş e

# BİRNAMEYEK

Amed

"U'wêş, sibe ye. Xezala min, sibe ye, sibe ye. Çelenga min. Bila derdan serî xwe nedana serî kulan, Eysa min, esmera min. U'wêş, sibe ye, bila derdan serî xwe nedana serî kulan, xezala min...".


Sibeh bû, xwe xisti bû nav nivînan û ji nav derketi bû, ci bû zerahiya sibehê (1) nuh lêdixist. Serê xwe di ber strana "Eyşa Ibê" (2) re wer dihejand ku dinya ronik hemî di pêş çavên wî re diçû û dihat. Geh gurrizî di canê wî re diçûn, geh hêrsa canê wî radibû û hildihat. Guhêñ xwe dida wê stranê, digot û tew dikir (3): "Omerê Cemlo (4), gorbîhiştê welatperwer, stranbêjiya te ya delal, xurtiya dengê te yî mîna zêngil, şêrîniya stranê te yêñ kevn, Eyşa Ibê, xezala te, a me tevan, qedera wê ya reş, derdêñ me yêñ niha û yêñ peyda dibin hemî xwe dane û xwe didine ser kulên berê.... mala me danî, konê me pêça... Tew-Tew! stranbêjê Cûmî (5)...".

Roj bi bejnemêrekê (6) hilat. Bi wan bîran, ji nav ciyêñ xwe derket, û berê xwe da dibistanê. Li wir, hêñ xweş-bêşıya şagirtan nekiribû, serkarê dibistanê kaxzeza derkirina wî ji hînkirinê, di bin navê "bive (tehlike) ye ji aliyê parastina dewletê de" da dest wî. Helbet, Mergo ji biryara segêñ zordest veciniqî, pişta xwe da dibistanê, pêşîra xwe da bajêr û hate mal. Pêna ku nêzîkî li mal kir, biraziyê wî, Hoşeng, berve wî bezî:

- Hê! fro apo zû ji mektebê (6) hat....

Biraziyê xwe berhembêz kir, hilgirt, destê xwe di pêrçema (7) wî re bir, nêrîneke kûr di çavê zarokê bêguneh de xwend, bi germiya canê xwe ew radimûsa, û bi xwe re bire hundir:

- Hoşeng, kurê min, hele ji apê xwe re çêra Newrozê bike...



- Apo, wexta em cûnî, e'skera kincêñ min, bi rê ve, li Newrozê, ji min şiqitandin, û ez tazî kirim.
- Tu tirsiyayı, canê min?
- Na, ez netirsîm, lê li bavo xistin û digotin: Çima te kincêñ kesk, sor û zer li qîçikêñ xwe kirine...
- Erê, canê min, niha wiha ye. Şêrînê min, mera kincan li zarokan dike ku şâ bibin û mera pê şâ bibe. Wekîdinê zordarêñ vî welatî şabûnê ji rûyê we yê Sipî - ne mîna yê wan ê reş û teví têdayî - direvînîn.... kurê min dengê lêketina derî hat. Li vir be, ez herim, binêrim ka kî ye.

Sê kûçikan bi kilaşînkovêñ xwe ve li ber derî vegevistibûn. Mergo hema bi şimikan (8) ve xistine Land-Roverê û bi xwe re birin.

- (1) Zerahiya sibê: gava dinya nuh zer dibe, ango, ron dike.
- (2) 'Eyşa Ibê': straneke Kurdî kevne, ji stranêñ folklorî.
- (3) Tew dike: mîna ku bêjî: bijî, erê, wilo ye, a te raste...
- (4) Omerê Cemlo: stranbêjekî Kurde. Berî çend sala çûye ser heqiya xwe. Ji stranêñ wî: Devrêşê Evdî, Eyşa Ibê, Bêmal, Welat û ên dinê.
- (5) Cûm: deşteke, li başûrê Çiyayê Kurmênc dikeve.
- (6) Bejnemêrek: bi qande bejna mîrekî.
- (6) Mekteb: Erebiye; dibistan.
- (7) Pêrçem: temirî; porê berheniyê.
- (8) Simik: ton solin, a sivikin, di mal de têne pê kirin.

- Hey kûçikbav! tu diçî Newrozê, ne!? Emê niha pêse te bikin Newroz çiye! Win dixwazin doza Kurdistanekê li vir bikin? Çi ne ev kincên kesk, sor û zer ku win li zarêne xwe dikine? Win bawer dikin em li vê derê li ber kerane. Em dizanin tu di kîjan partiyê de yî û tu çi karî dikî. Emê niha heqê te bidine te. Here oda dinê!


Mergo, di odê de, nexwest ji xwe bipirse: Çima ev sitemên hanê yên bê guneh li ser serê Kurdan pêk tê? an ne çima? Tenê destê xwe kire bin heniya xwe û kûr rama. Di serê xwe de, ji vî serê dinyayê ra (9) serê dinê, da hev û ponijî. Faris, canemergê ku bi destê faşistên Iraqê hatî kuştin - 1985, anîye bîra xwe dema ku ji wî re digot:

- M. ez apê te me, law. Em dizanin gelek karwanan canemergan dê qelengê Eyşa Ibê, Xezala Rohilat, bidin.

Hêñ Mergo di van bîranînên xwe yên şérîn de bû, segan dev avêtînê:

- Kurê kûçikan. Virde were: Xwe tazî bike. Nabe tiştek li te hebe. Bi carekê xwe şîlf-tazî bike! Emê niha Newroza te û a merivê we, Berzanî, pêse te bikin. (Seg nizane Kurdîtî çi ye. Tenê navê Berzanî bihîstiye).

Ne ewqasî girînge ku mirov lêdan, iş-kencekirin, elektrîk kirin, û êşandinê hewal de çinkî ev jiyanek rojane ye ji (9) Tebat: sebr, aram.  
(10) Ra: ta, heta, heyâ.



hemî welatparêzên vê stêrkê re; ango, ji stêrkparêzan re. Tenê pirsa tarî ku ji aliyê zordestê perçê Roava de ji Mergo dihate pirsîn ev bû: "Tu Kurd-Erebî an Ereb-Kurdî?!".

Ev pirsa jorîn a 'ewravî' nahêle ku ev kurteçîroka bîrnameyî bi kutahîbihêt.


Berra wê pirsê di Civata Neteweyê Yekgirtî (U.N.) de hate rêxistin. Mixabin endamekî berpirsiyar ji bo gelê Kurd, ku hejmara wî bêtirî devedevî 20 milyoni ye, tine bû ku bersiva wê pirsê li nav çavêwan xîne; çavêwan ku xwe kirine nedîtine di serêne wan de beq bike. Berpirsiyarê NATO tiliyêne xwe hildan û gotin:

- "Ev pirs ji koka xwe de a kêm e. Divê ew wiha be: Tu Kurd-Tirk-Faris-Erebî an Ereb-Faris-Tirk-Kurdî?".

Di vê lîstikê de, jinika endam a berpirsiyar a Amerîka ji nav hemiyan tebata (10) bersivandinê pê neket, got: "O.K. em vîto datînin ser perçê yekem ji wê pirsê û em bi perçê duwem re ne, vê gavê".

Haya Mergo yê ku di zîndana tekane de tine bû ku pirsa ji wî hatî kirin hêj dirêj, pan û girêkî bûye. Li ser çocka rûniştî bû, pişta xwe da bû dîwarê zîndanê yê sar, pêşîra xwe da bû deriyê wê yê hesinî û dilorand:

- "Erê, U'wêş, sibeye, bila derdan serî xwe nedana serî kulan".



# DÎROKA KURDISTANE DÎ

- X -

## IV- Cîvaka kurdî

Jîna civakî û aborî ya Kurdistanê baş damezrandî ye. Eger hîn beşike piçûk ji gelê kurd jîna koçeriyê dijî, piraniya wî ya mezin îcar di gelek gundan de gawastî (ne koçer) ye, lê "hîn iro jî, li gundan, cîvaka kurdî bi hêzanî êlî ye" (Edmonds, 12), û ew li ba koçeran jî ewha ye. Lê li gundêñ neêlî, pêkanîna tofê (kom, grûp)

di bin kartêkirina (tesîr) sazendeya (ida-ret) hikûmet, axa û şêxan de ye. Ev yek hin guhertinan tîne damezranêñ bingehî ku iro gelek pêş ve diçin, di cîvaka kurdî de: Malbat, êl (eşîr), zewî (erd), ku emê di destpêkê de li wan hûr binêrin, berê ku em kartêkirina olî (dînî) li ser wan bibînin; paşê emê adetên cîvakî ku girêdayî wan in nîşan bidin.

### A- DAMEZRANÊN BINGEHÎ YÊN CIVAKA KURDÎ

#### 1- Malbat kurdî

Malbat kurdî ya xwederî (tebîî) ji hucre yan hêlinêke ku ji bav, dê û zarokan pêk hatiye ava bûye. Ev hucre, ku li ser zewacê ava bûye, bi awakî giştî yekjinî ye û ne patriyarkal (di bin destê bav de) e. Zewac bingehî ye. Li Kurdistanê ne law û ne keçen nezewicî hene. Ango, ne bêzewacî ne jî hezkirina serbest heye. Qehbikî li bajaran piçûk ên kurdî yêñ Iraq û Iranê tu neye. Zina hema tu neye, ji bo ku gelek bitehlike ye. Cuhan zû dizewicin: Law 20 salî û keç 12 salî. Lê li bajaran û ji gava ku cuhanêñ kurd xwendina xwe dirêj dîkin, zewac derengtir dibe. Gelek caran pismam û dotmam bi hev re dizewicin. Pismamê nêzîk bêtir tê xwestin û mafêñ wî li ser dotmama wî hene. Ev yek gelek aliyêñ wê yêñ baş hene, ji bo ku bavê bûkê xwarziyê xwe, ku çêtir dikare keça wî biparêze, baştır nas dike. Bi ser de jî, di dema şerrêñ êlî de, bi hêzanî ji berê, ev yek tifingeke din dianî; û bi eynî awayî qelen kêmter dibe. Ji bo ku dev ji dotmama xwe berde, ewê pismamê nêzîk buhayê vê berdanê bixwaze, yan jî ew dikare keçikê birevîne yan jî wê û merivêñ wê bikuje (Daghestani, 22-3). Ango revandin, teví tehlikêñ wê, ne nenaskirî ye ('Akrawî, 130; Daghestani,

17). Zewac dikare bi berdêlî jî bibe (Avdal 222; Daghestani, 3). Di vê rewşê de, qelen nayê xwestin, bitenê mesrefêñ dawetê dimînin. Zewac dikare di nav kesêñ ku qet ne merivêñ hev in bibe, lê çêtir e ku ji eynî



gundî yan êlê be, ango zewac hergav di nav eynî tofê, bi awakî fireh, de dibe. Barth (61) karî bû bibîne ku zewacêñ pismam û dotmaman di nav gelheyêñ êlî de (57%) ji yêñ ne êlî (17%) gelek bêtir in. Loma,

(\*) Encyclopédie de l'Islam, 1981, Parîs. Wergerandin, fransizî-kurdî: Pervîn.

# ANSİKLÖPÉDİYA İSLAMÊ DE. (\*)

giring e ku girêdanên malbatan û navê wan baş bêñ zanîn (li nexşa malbatiyê: Leach, 63; Barth, 31; Hansen, 116 binêre). Li ba yezîdiyan û Ehî Heq, zewaca nêzîk di nav hin malbatan de icbarî ye (Avdal; Mokrî, 44). Qelen, ji derveyî rewşen ku li jor hatin gotin, li herderî icbarî ye (Daghestani, 28; Leach, 44-45; Hansen, 123-4) û ew ji aliyê kesen ku wê dixwazin ne hergav weka firotin, weka ku li Ewrupa zêde tê gotin, tê dîtin. Di vajayê (eks) vaya de, ew wê weka nirxdana (teqdîr) buhayê (qîmet) xwe dibînin. Ev qelen, ku li gora navçeyan û bi hêzanî li gora rewşa civakî ya malbatê diguhere, bi maddeyên tebfî (ne bi pere) tê dayîn: Lawir (heywan), zewî, aş û hwd., yan bi pere. Ev yek pirr diguhere û carna dikare xwazgîn bê hêvî bihêle. Li gel rexnan (kritik), heta li ba Kurdên Sovyêtistana, ev adet bicarek hunda ne bû. Li ser vê babetê, li hin helbestêñ ku di Meşriq, 1958 de hatine wergerandin binêre. Qîzbûna keça cuhan berê zewacê divê bê gûman be, û isbata wê divê di şeva dawetê de bê nîşan dan û ji hindikayî ve salekê bê hiştin (Nikitine, 109, 115; Hansen, 133-4; Mokrî, 68). Zewaca pirjinî jî li ba Kurdên misilman û yezîdî heye. Pirjiniya ufuqî yan a eynî demê ji berê û heta di sedsala XIXmîn de jî gelek caran dibû. Serokê êlan hergav bi çar jinên şer'i ku qur'an destûr (izin) daye têr ne dibûn. İbrahim Paşa, avakerê Suleymaniye, çil jinên wî hebûn (Campanile, 107); Bedir Xanê mezîn 14 jin û 99 zarokêñ wî hebûn. Di mirina wî de, jê re 21 law û 21 keç mabûn. Ev adetêñ han derbas bûn. Ji berê, pirjinî nîşana dewlemendî û hêzbûnê bû; iro ew carna pêwistîyeke aborî (iktisadî) ye. Meriv hîn wê di civaka bajarı ya kêm xwendâ de dibîne (Hansen, 138), lê di civaka gundi de jî (Barth, 25). Li gel vê qasê, li cihê ku meriv rastî wê bê, ew ji 2% li Çiyayê Kurdan (Daghestani, 79), 4% li Iraqê (Barth, 24) derbas nabe, û qet ji du jinan bêtir tu neye. Di navbera xwe de, ew ji hevdu re hewî dibêjin. Li Tirkiyê û li ba Kurdên sovyêtî pirjinî li gora zagona (qanûn) medenî qedexe ye. Lê hîn pirjiniya şaqûlî yan a dûhev heye, bi saya berdan yan avêtinê, ji bo ku eger mîr bitenê sê caran bi "telaq" sond bixwe, ew dikare jineke ku ew nema jê hez dike bavêje û bi yeke din re bizewice. Bi vî awayî, Şex Şadala, di 70 saliya xwe de, 19 caran zewicî bû (Hansen, 138), û bi eynî awayî İbrahimî pîr, axayê Dizai (Hay, 43). Jin dikare ji sedema nekarîna anîna zarokan



yan zarokêñ nîr jî bê avêtin. Di vê rewşê de, ew dikare li ba mîrê xwe bimîne. Eger ew ji bo sedemîn din bê avêtin, ew vedigere ba bavê xwe û bextê (şans) wê ya zewaceke nuh kêm e. Jina ku bi zina, yan bitenê bi gûmana zina, bisûc e, ne bitenê tê avêtin, lê dikare ji aliyê bavê xwe bixwe, yan birayê xwe, yan yek ji merivîn xwe bê kuştin. Zarokêñ jina qewrandî li ba bavê xwe dimînin. Bî (jina ku mîrê wê miriye) li mala bav yan birayê mîrê xwe dimîne (Barth, 29). Markirina jina birayê xwe piştî mirina wî carna û hema li herderî çêdibe (Daghestani, 99; Avdal, 221; Barth, 29; Edmonds, 348; Hansen, 136), ne ji bo ku ev zaginek e, lê adet e. Di malbata kurdi de, destelata (iktidar) mezîn di destê mîr de ye, lê jin jî gotina wê heye. Li ser rewşa jin û mîr, Mme Hansen (117) dibêje ku rewşa jin li gundêñ piçûk ji ya mîr nizmtir e, li ba arîstokrasiya gundi û li civaka bajarı ya xwenda weka ya wî ye, lê li civaka bajarı ya ne xwenda ji ya mîr bilindtir e. Eger xwestina zarokêñ nîr ne hergav ji ya keçan bêtir be jî, çêbûna zarokan hergav daxwaziyeke mezîn e. Zarok pirr in lê piraniya wan bi nexwesiyyêñ zarokan ên dijwar dimirin. Muamela zarokan hergav baş e, lê bê delaliya zêde, ji bo ku jîn hişk e. Navê wan ji zabûnê, û bi awakî giştî ji aliyê jinan (Nikitine, 106) û carna ji aliyê mellê (Barth, 112; Hansen, 108), tê danîn. Ev nav piraniya caran ê şexsiyeteke islamî, qehremanekî dîrokî yan ê efsaneke netewî, ê rewîştêñ (exlaq) baş ku meriv dixwaze ku nuh-za xwedîye wan be, yan navê gul, meywe (fêkî), lawirekî ku herkes rewîştêñ wî baş dibîne ye.

Teşeyên (şikl, awa) hezkirinê yên navan gelek hene. Hin nav di eynî zemanî de nîşana "o" ya nîr û ya "ê" ya mî ya wan heye. Lî, tişteke ecêb, teşeyên nîr ji bo bangkirina kesên ne resen (esîl), lê teşeyên mî ji bo şexsiyetên ku ji zabûnê resen in têr bi kar anîn (*Celadet Bedir Xan, Grammaire*, 98). Li ser nav, piçûker, sernav, li Edmonds, 42 binêre.


Sunnet çend rojan piştî zabûnê tê kirin, yan ji aliyê sunnetkerekî taybetî yan ji ji aliyê berbereki besit (Barth, 112; Nikitine, 106). Li hin cihan, ev merasim derengtir çêdibe, gava ku zarok dibe 5 yan 7 salî, û gelek caran çend zarok bi hev re têr sunnet kirin. Serok yan mezinê ku lawê wî divê bê sunnet kirin cêneke piçûk pêk tîne û ji malbatê agahdar re xwarinekê pêşkes dike (Barth, 112).

## 2- Pêkhatina êlf

### a) Nexşa êlên kurdî

Regezekî (unsur) bingehî yê civaka kurdî bê gûman êl e. Tro di destê me de navên hemî êlên kurdî hene. Hîn di 1826 de Lerch jimareke baş a Kurdên Tirkîyê (63-87), ên zewiyên rûsî (88-9) û yên zewiyên farisî (92-121) derxisti bû. Jaba (1860) hin jîmaran dest nîşan da bûn (1-8 ji metnê kurdî). Nexşeke cihê rûniştina wan li Piştî-Qefqasyê, li Tiflisê, ji aliyê E. Kondratenko (1896) û Col. Kartsev (1897) hati bû weşandin. Di 1908 de, Mark Sykes navên 305 êlên kurdî yên imperatoriya osmanî derxisti bûn, û G. R. Driver (1919), gava ku lîsteke ji ya Sykes cihê çêkir, êlên kurdî yên Kurdistana Başûr (Iraq) û yên ku li derveyî Kurdistana ku piştî Şerrê Mezin hat dest nîşan dan ma bûn ragihandin wê lîstê (19-74). Lî bûyerên rîzanî (siyasî) yên cihê ku ji wê demê çêbûn gelek guhertinan di beşbûn û rewşa êlên kurdî de anîn. Di weşana kurdî ya pirtûka xwe "Dîroka Kurdistanê" (1931) de, M. Zekî nexşeke giştî ya hemî êlân çêkir (319-398, wergerandina erebî "1939" 373-468, tevî xarite). Èlên kurdî yên Sûriyê ji aliyê sazendeyên fransızî yên Rojhilatê di 1930 de (beşa 5mîn, 137-190), û bi awakî paktir û hûrtir, ji aliyê P. Rondot, di 1939 de hatin jimartin. Lîsteyên êlên kurdî yên Iraqê (Nº 66, 14 Çile 1946) û Iranê (Nº 68, 4 Sebat 1946) ku bi kurdî di Roja Nû de hatine weşandin baş bi kar nayêni ji bo ku, bi hêzanî jîmarêni wan, ne pirr vekirî ne. M. Mokrî, bi farisî, li ser êlên Sencabî yên Iranê agahdarî da (1946), û A. 'Azzawî bi erebî (1947) lêhûrnîneke gelek baş li ser êlên kurdî yên Iraqê (27-222) çêkir. Lîsteke baş a êl û bin-êlên Iraqê, ên Kurdistana Bakur (18-27) û Kurdistana Başûr (45-51) ji aliyê H. Field di Anthrology of Iraq (1953) de, tevî giringiya wan a jîmarî,

navên serok û cihêni wan, ji me re hatiye dayîn. Lî bi rastî, ev zanîn berê yên ku 'Azzawî da bûn in. Meriv, bi farisî, navên 4.900 êlan di Merdûx (1953), I, 75-119, de û lêhûrnîneke dirêj li ser êlên Sanandajê (II, 10-48) dibîne. Di dawîyê de, B. Karabuda, di heş kartonan de, rata (cih) êl û bavekîn (êlên piçûk) kurdî yên Tirkîyê di wilayetên Urfa, Mardin, Diyarbekir, Siirt, Bitlis, Mûş, Wan û Hakkari de, û, li gora rewşan di qezayên sînorî yên Sûriye, Iraq û Iranê de, pêşkes dike. Eger em werin êlên yezîdî, ew, bi rîza (dor) xwe, ji aliyê A. 'Azzawî di 1953 (90-110) de hatin jimartin û cihê wan hat dest nîşan dan, û bi taybetî yên Sincar û Çiyayê Kurdan ji aliyê R. Lescot (1938), 251-61.



Giringiya vê tablo û lîsta fireh bi hêzanî ev e ku ew navnetewîbûna diyarbûneya (hadisa tebîî) êlî di dîrok û jîna gelê kurd de nîşan dide. Bi taybetî, em li ser van êlên cihê ranawestin. Berhemâ (eser) sereke Serefname (1596) dimîne. Gelek zanînê dîrokî û êtnografîk di berhemêni cihê yên Soane (1912-26), Longrigg (1925), Leach (1940), Nikitine (1956), Barth (1953), Edmonds (1957) de hene. Lêhûrnîneke mukammel a êl, bavek û gundêne yezîdî, tevî stasîstîkan, ji me re ji aliyê S. Damlûcî (1949), di berhemâ xwe ya li ser Yezîdiyan de, bi erebî (224-60), hatiye dayîn.

### b) Ela kurdî û regezên wê

"Ela kurdî civakeke yan tevayiyeke civakên ku ji bo paraztina endamên xwe dijî êrîşeke derveyî û ji bo hiştina adetên nijadî yên kevn û awayê jînê dijî ye" (Hay) 65). Rast e ku welatekî çiyayı, weka Kurdistanê, ferzend (firset) dide bişkiv-bûna tofîn kêm zêde girtî û li ser xwe pêçayı, weka ku êl di destpêkê de dikare bibe. Li gel ku ew weka her tofeke mirovî ku ji dendika malbatê ava dibe hatiye

damezrandin, çewt e ku meriv bawer bike ku êla kurdî malbateke firehbûyî ye, hinek weka ku Tewrat li ser donzdeh êlên Israîlê dipeyive (F. Millingen, 284). Bi rastî, civakzanêñ kurd ên nûjen dijî vî awayê dîtinê ne. Eger hestiyê pişta êla erebî (qebîle) girêdana malbatî be (neseb), li ba Kurdan ew zewî ye, ango navçeya ku hemî tê de rûdinêñ û ku di bin destê tofê de ye (Khosbak, 68; 'Akrawî, 18). Lî, civakzanêñ ewrupî ku li pêkanîna êlî li ba Kurdan hûr nêrîne (Leach, 1940; Barth, 1953; W.L.E., 1956) cihêtiyan ji alîkî li ba koçeran û ji alîkî din li ba gawastiyen dîtine. Bi vî awayî, Barth li pêkanîna rêzanî ya Cafan, federasyoneke xurt a êlan, ku hema heta demeke nêzîk bi tevayî koçer bû (34-44 û wêne N° 3), li pêkanîna rêzanî li ba Hamawendan (45-9 û wêne N° 4 û 5) ku tê de abor li ser hatina çandinê (ziraret) ava bûye û ku tê de regezêñ ne koçer tev li hev dibin, û di dawiyê de li ser pêkanîn û damezrana rêzanî ya Babanan, malbateke mîrî (60-66 û wêne N° 6) hûr nêrî. Ji aliyê xwe, W.L.E. yê bênav (432), dikarî bû di nav gelheya gundî de celebêñ pêkanîna civakî û aborî yêñ cihê bibîne.

**Nîşe:** Ela klassîk ku di bin axê de, ew dibêje, ji rayekî (esl) tenê ye û di "tira" (beş) de veqetayî ye, weka Girdiyan; û êla ku di bin serokekî derebe (fêodal) de ye û ji rayêñ cihê ye, weka Dizaî û Cafan. Kartêkirin û rola civakî ya axa û şexan, ku ne serokêñ êlan in, alîkî din ê vê pirsêne (li Rondot, Les tribus montagnardes, 39-47 binêre). Ji derveyî vana, meriv di civaka kurdî de çînêñ (sinif) civakî yêñ rast dibîne. Cihêtiya vekirîtirîn di navbera gundiyyêñ ji rayê êlî û yêñ ku ne ji vî rayî ne û ku navê wan li gora navçê û zaravan hatiye danîn, weka Kurmanc, Goran, Miskîn, ku hin ji wan koleyêñ malxweyêñ (xwedî) gund in, heye (Nikitine, 124). Navê dawîn, Miskîn, diviya ku bêtir bê gotin, dibêje Edmonds (123), ji bo ku duduyêñ din rîzayêñ (mana) cihê nîşan didin (zarav yan êl). Dibe ku meriv wan weka gelheyêñ rayî ku ji aliyê êlên şerker hatin êrîş kirin bibîne? Lî heta di hundirê eyî ûlî de wekheviyeke maf û erkan (wezîfe) tu neye. Berê malbatêñ resen hene, meriv dikare bêje, "torin", weka Begzadayan, û yêñ neresen ku berê çîna leşkerî, xulam (Nikitine, 125) yan "piştma" (Barth, 42), celebeke dergevanêñ serokan ku ji nav hemî "tira" yêñ êlî têñ bijartîn (Barth, 46) û ku, ji berê, hema kole bûn (Nikitine, 125) ava dîkin, û li dawiyê çîna gundiyan.

Dibe ku meriv nuha bikare nexşa klassîk a pêkanîna êleke kurdî li gora Rondot (Tribus, 18) li ser Omeran nîşan bide. Di bingehê de, xanî yan malbata ku bitenê ji bav, dê û zarokan ava bûye. Tofeke xaniyan "bavik" yan "mal", malbata firehbûyî. Civandina çend bavikan "ber" yan "bavek" ava dike. Tevayıya hemî van bavekan êl yan

"esîr" dide. Ev binavkirin li ba Barth, ku weka nîşe êla Caf di hin "tira" yan besan de vediqetîne, cihê ye. Ev tofeke rêzanî ye ku divê em bi "hoz" ku tofeke ji eyî rayî ye tev li hev nekin. "Tira" di çend "khel" de beş dibe. Her "khel" ji 20 heta 30 kon yan malbatêñ ku bi girêdanêñ aborî yan malî yek bûne ava dibe. Di serê "esîrê" de Paşakî ji malbata "Begzadayan" heye yan hebû. Her "tira" di serê wê de "reis" heye, û di serê her "khel" de serokekî gund ku hatiye bijartin, "kîxa", heye. Li ba Hawamendan, serokê "tira" navê wî "axa" ye. Ji aliyê xwe, Leach (13-4) "esîra" ku "navê wê di eyî zemani de navê gel û zewiyê ku tê de rûdinê ye" dibîne. Ev bi hêzanî weka tofeke rêzanî ye. Ew ji yek yan çend "bavek" yan "taîfe" ava bûye, weka tofeke malbatî, û di "tira" yan besen piçûk de veqetiyaye. Û ew dibêje ku bi vî awayî rîzkirina antropolojîk a xwederî (tebîî) dibîne: Asîra, taîfa û tira, ango êl, bavek û bes (kesen sax ên ku ji eyî malbatê hatine). Ev cihêtiya binavkirinê ku tê de gotinê erebî û kurdî yêñ zaravêñ cihê tev li hev dibin qet ronîkirina vê pêşandanê hêsan nake.

Em sistema "oba" (li "khel"? binêre) ku bi taybetî ya êlên nîf-koçer e û ku di nêzîkî dawiya sedsala XIXmîn û destpêka ya XXmîn de xuya bû nîşan bidin. Ev yekbûna katî (muweqqet) ya xwedîkerêñ gundêñ cihê di beharê de pêk dibe, ji bo ku ew kerîyan bibin çergehan û di dawiya payîzê de ji wan vegeerin. Ne girêdanêñ malbatî û ne êlî pêwist in ji bo ku meriv bibe endamê "oba". "Ser-oba" yan "oba-bâsi" barkirinê, li hemberî dayîna tiştêñ tebîî, pêk tîne. Li wê derê ji cihêti di nav tofan de têñ dîtin: Serok "ser-oba" û malbata wî,



malxweyên cihê yên kêm zêde giring û şivanêni besit (li ser vê pêkanîna "oba", li Ereb Şemo, Şivanê Kurd, weşana Beyrût 1947, 29; Nikitine, 149-52; Qasimlû, 158-60 binêre). Li gora O. L. Vilchevsky, Economie de la communauté agricole chez les Kurdes, 1936, li dora "oba" ye ku "têkoşîna çinan" li Kurdistanê bi cih dibe.


c) Serokê êlê, mecbûriyet, erk û nirxdanêñ wî

Serokê êlê, giringiya wê ci be, jê re bi awakî xwederî "axa" tê gotin. Ev nav hinek nuh e, ji dema kevtirîn a vegirtina (işgal) Begdadê ji aliyê Sultan Murad IV di 1637 de (Edmonds, 223). Ew hergav ji malbata serokan e. Ew vê rêzê bi wirasetê distîne, lê ne hergav. Lawê mezintirîn bi awakî giştî cihê bavê xwe yê mirî distîne, lê ne hergav, ji bo ku birakî piçûktir ku jê jîrtir tê dîtin, ji bo ku ew jêhatîtir e yan bêtir tê hez kirin, dikare cihê birayê xwe yê mezintir bigire. Lê ev bijartin dikare piştî helbijartina serokêñ din ên bavekan, yan heta, eger pêwist be, bi hişkî bê çêkirin.

Di dema derebekiyê de, serok, hema di êla xwe de otonom, diviya ku ji walî, sultan yan şah re nirxan bi awayê kerî yan

bacan (vergi) bide. Bi taybetî wî ev nirx ji gundiyêñ xwe, ku ew diviya di dema şerr yan tehlikê de wan biparêze, distendin. Lê ev ji dîroka kevn e. Iro, serok erkêñ wî yên din hene û bi taybetî erkê hewandina mîvanêñ ku derbas dîbin, Kurd yan biyanî, yên kêm zêde pirr, li gora mewsim û munasebetan li ser wî yan nûnerê wî ye. Ji bo ku karibe mesrefa xwe derxîne, serok xelkê êla xwe mecbûr dike ku hin bacêñ ku bi awakî giştî navê "aixatî" distînin bide. Ev bac ev in: Hemî hebûnêñ şivan yan gundî, rojêñ kar ên bê pere "herewaz", diyariyêñ icbarî "êdanî" yên cihê di hin munasebetan de (zewac, cêjn), perê dadiyê (edalet) yan cezayêñ neqdî ku ew dikare ji sedema dizî, revandin yan kuştinê bistîne, eger meriv mudahela wî bixwaze ji bo ku ew dadiyê bike (hûriyêñ "tefsîl" hemî van bacêñ ku divêñ ji serok re bêñ dayîn di Th. Bois, Connaissance ...., 36-8, yan La vie sociale, 610-1 û nîşankêñ 46 û 47, tevî çavkaniyan, de ne). Divê ku meriv van bacêñ êlî û yên şivan û gundiyêñ kurd, ku divêñ bidin axan, tev li hev neke.

Dûmahî heye



# Ê ZÎDÎ Û ZERDEŞTÎ

TORÎ

Hin bûyerên civakî hene ko ta belgeyêن dîrokî ko bingehêن wan bûyeran bi zelalî, pak bi me bidine nasîn, dernekevine holê, ew bûyer bi awayekî zanistî nayêne zanîn. Bûyera Ezidîtî ji yek ji van bûyera ye. Dema ko em li vê bûyerê hûr bûn, me viya ko em di der heqî Ezidîyan de, nexasim di der heqî ol û rawşa wana yî civakî de serwext bibin, emê destevala vegevîyane. Ev jî, ji neyîna belgeyan diaferî. Lî di roja me de, bi lêkolinan belgene nû derdikevine holê. Dema ko em li van belgeyan hûr bûn, me wan belgeya bi hev re girêda, emêbihêsanî bigihêjine dawînena. Herweki: "...îroj di Kurdistan de hin eşîrên Ezidî, li nav Bohta, Xerza û hindama Bedlîsê de, li Şingal, Diyarbekir, Wan û Sêrtê de, bi navê Xaldî hene. Mîrê Bedlîsê Şeref Xan, di pirtuka xwe Şerefname de dibêjî ko, bitenê hin eşîr hene ko li dora Musil û Şamî bikoçeri dijîn..... ji ber ko Ezidî ne, bi ya zanista İslâmî nekin" (1).

Di vê belgeyê de du wûşê hene ko em li ser wana birawestin. Yek ji wana wûşeyâ (Xaldî), yan din (Ezidî). Hege em ramana van herdu wûşeyâ zelal kir, emê nêzîkayîyê bidine sedemê.

Netewê Xaldî, netewekî kevtirîn ji netewê rojhilate navîn e. Xaldî di dîrokê de bi navîsarên kîralen Aşşuriya Şalmâ-nassarê yekemîn (1272-1243) û Şalmanassarê sêyemîn (858-824) cara yekemîn dinasin. Dîsa ev netew cara pêşî di navbera çiyayê Ararat (Agirî) hatine dîtin. Navê Ararat di pertuka pêxember Musa de, di awayê (Urartu) dibihurî. Pêwanê Aşşurî vî netewî bi navê cihê lê dijîya navandine. Di nivîsarên xwe de navê (Urartu) ji bonî netewê Xaldî bikar anîne. Ew netew bixwe bi navê (Bîa) dinasî. Bi gelempêri, ko ji alîyê wê navçeyê dihat nasîn, navê (Xaldî) ye. Ev nav jî navê xwedayê wî netewî (Xaldî) dahat. Xweda Xaldî, di lîsteya xwedeyan de di rîza yekemîn de cih digirt. Di vê lîste-yê de 79 xweda hebûn û ew lîste bi şêweyeke fermî (resmî) hati bûn pejirandin (kabul). Ji vê lîsteyê em tê digihin ko netewê Xaldî layî pismamîn xwe yî Arî, di bîr û bawerîya gelek xwedayan de bûn. Herweki, layî ko me li jor derbirî (anlatma), xwedayê Xaldî û pê ra xweda Teşîba, Şîwinî, pîreka xweda Xaldî xwedaya Arubanî (dibî ko Xutunû jî bî), xwedaya Arrînna, xwedayê heyvê Sarîs ji van xwedaya ne (2).

Dewleta Xaldîya di sala (B.M. 600)an de, ji aliyê Medan hate hilwesandin. Netewê Xaldî di nav Meda û ji bakur ve cîranêna wana Ermeniyan de heliyan.

Zerdeşt, di sala (B.M. 569)an de dest bi belakirina ola Zerdeştiyê kirîye. Ola Zerdeştî di sadsala (B.M. 5-3) ola imperatoriya Med-Pers, di sadsala (B.M. 3 - P.M. 3) ola dewleta Parta, di sadsala (P.M. 3-7) ola Sasaniya bû. İranî piştî vê sadsalê bûne misilman.

Netewê Xaldî layî ko me li jor der birî, ola Zerdeştiyê ne di heyama dewleta Xaldîya, di yekîtiya dewleta Meda û di imperatoriya Med-Pers de pejirandin û parastine. Netewê Med ta sala (B.M. 34)an berjîyan bûn. Piştî vê berwarê (tarih) êdî em di nav belgeyê dîrokî de liqayı navê Meda nabin. Bi çûyina Meda, bi teybeti dewleta Kurda jî tevlu rûpelîn dîrokê dibin. Bi tev belgeyan ra, ji sala (B.M. 550)an ve, bi gotineke din, ji damezrîyana dewleta Pers-Medan pê ve ketine ber destê Persa. Pişt ra jî Selefkiya, Parta û Sasaniya.



Zoroaster

(1) Cigerxwîn, Tarîxa Kurdistan, weşanê Roja Nû.

(2) Nêrgiza Torî, Kürtlerde Din (basilmak üzere).

Nexwe ne ko pertuka ola Zerdeştî Zend-Avesta winda bûyiye (Zend-Avesta di nav Ezîdîyan de bi navê Mishefa Reş tê nasîn û dîsa li gora wana ev pertuk winda bûyiye). Li ser çermê hazar û du sad (1200) çêlêkê, bi ava zêrîn hatîye nivîsandin û nûha di xezîneyên pêmayên wan dewletan de ye.

Piştî ko me wûşeya (Xaldî) bi vî awayî danasand, em bêne danasandina wûşeya (Ezîdî). (... Ezîdî Kurdêne xwerû ne û ola wan îro, ji averûya gelek olan bi hevketîye û hatîye pê. Ji ber vê yekê ye ko dema em bawerî û rê û rêzanêن ola Ezîdîyan didine ber gevê xwe, bi rehetî tê de şopên olên Zerdeşt, Musa, Isa û Mihemed tev dibînин. .... Rojekê piştî belavbûna civînê di rê de min ji Cegerxwîn ev pirs kir. -Seyda! Ev bûn şes heft civîn ko tu jî bi min ra rudînî. Ma gelo ji ola Ezîdîyan ci dikeve serê te?

Seyda bi nêrîneke manîdar û rûkî bi ken li min vegerand û got: - Ne tiştek. Berî ko ez wan şêxan bibînim, min dizanî ko ola Ezîdîyan jî wek olên mayî li ser bingehekî hatîye danîn. Lê niha min zanî ko ji torta oline têvel pê ve ne tiştek e. Heke tu î serwext, î teqez tê bîr birîye ko gotinêن wan şêxan "çêla şêxên Ezîdîyan tê kirin" ên duh û îro nabine yek) (3).

Bi van belgeyan em tê digihin ko ola Ezîdîya yî roja me, ne girêdayî rêzikêñ ti olî ye. Dema ko em bi ola Ezîdîyan ve gün, layî ko emê li jêr raber bikin, civaka Ezîdîyan de du çînî hene. Çînîyek ji alîyê ol, yan din jî ji alîyê civakî ye. Ev herdu çînî di ola Zerdeştî de nîne. Di ola Musa, Isa û Mihemed de jî nîne. Nexwe divê em bingehêن van çînîya ji dawerine (kaynak) din bigerin. Ev dawer jî, bi teybetî dawerê netewê Xaldîya ê pêşî ne.

Di civaka Xaldîyan de çînîyeke destlikarê (görevli) ola Xaldîya hebû. Ev çînî di civaka Xaldîyan de cihekî giring digit. Ev çînî dewlemend bûn. Perestişgehêن (tapinak) ola Xaldîya jî gelek dewlemend bû (4).

Dema ko me li Xaldîyêن roja me, bi gotineke din, me li civaka Xaldîyêن roja me meyizand, emê wê çînîyê û destlikarê wê çînîyê bibînin. Herwekî destlikarê ola Ezîdîya (5):

#### 1) İxtîyar:

Di ola Ezîdîyan de wek xelîfeyêن misilman, papasêن (keşe) fillahan e. Rêzanêن ola Ezîdîyan digerênin. Di dema qewimîna şolêن (sorun) mazin de ixtîyar xwedîyê gotina dawîyê ye û herçiya ew bêjî, divê wilo bî. İxtîyar ji nav malbatêن şêxan de têne bijartin. Ji bonî

bijartinê, di vê ko ew kes xwedî sir û kerem bî. İxtîyar ta ko tiştine bê rê nekî, ji ixtîyarî nayê avêtin.

#### 2) Xelîfê ixtîyar:

Di malbata şêxan de yekî jê ra sir û kerem çê bibî, dikare xwe eşkare bikî. Ew kes di vî rawşî de dibî xelîfeyê ixtîyar. Dema ko ixtîyar bimirî, ew dikarı sicada ixtîyarî bigirî destê xwe. Di vî rawşî de kes têkilî wî nabî.

#### 3) Şêx :

Mazinatîya ola Ezîdîyan di desten wanân de ye. Riya bawerîyê, limêj, rojî û dêlîndizan (merasim) ji şêxan têne hînkirin.

Ezîdîyêن ko îroj bi rêzaneke eşîri dijîn, di bin hikme şêxan de ne (di vî rawşî de du erka têni cih. Yek jê erka olî, yan din jî ya civakî ye). Her çend eşîr ji wan, bi şêxekî ve girêdayî ne û dayinekî didinê. Her şêx di nav xelkê xwe de xwedîyê girêdan û berdanê ye. Di ola Ezîdîyan de piştî ixtîyar, şêx tê.

#### 4) Pîr :

Piştî şêxan pîr tê. Di bin destê şêxan de ne. Di nav xelkê de şungirt (halef) û arîkarê şêx têne nasîn. Aborîya wî li ser dayina ko xelkê eşîrê didî şêxan e. Du par ji şêx, parek ji pîr ra ye.

#### 5) Feqîr :

Piştî pîran, feqîr tê. Her mirîdekkî ko di ber destê şêx û ixtîyara de xizmeta ola Ezîdî bikî, dibî feqîr. Feqîr di nav Ezîdîyan de digerin û di der heqî olan wan şîretan dîkin. Debora wana bi parsê ye.

Feeqîrtî layî şêxitî û pîrîtîyê ji bavê nagîhi kur.

#### 6) Koçek:

Ji şêx, pîr, feqîr û mirîdan ko kîjan bibî xwedîyê keramet, haya ixtîyar pê têni. Dema kerameta xwe bi ixtîyar didî qabulkirin (pejirandin), hingî dibî koçek.

Koçek, her gav pêşandeye (göstermek) nûçeyan (haber) didin û nexwesan bi diyan xwes dîkin, an jî axa avayîyeke miqedes teberikê salixî nexwesan didin. Hemberî van diyan an salixan (salik) teberikê sedeqeyê digirin ko riya debara wana di wê de ye.

(3) (5) Osman Sabri, Ronahî (19, 20, 21), 1943.

(4) Louis Vanden Berghe en Leon De Meyer, Urartu.

# WEŞANÊN TÊKOŞER

XEBATA TÊKOŞER  
LI SER ÇANDA KURDİ

1

## XWENDÎNA ZİMANÊ KURDÎ

Pêkantî: Hînkar TORÎ

Cursa Yekemîn

KOERDISCH-NEDERLANDS

VOOR

KOERDEN EN NEDERLANDSTALIGEN



TÊKOŞER «De Militant»  
P.B. 33, B. 1730 ZELLIK

KURDÎ - HOLANDÎ

JI BO

KURDAN û HOLANDIYAN

koerdistan

BEKNÖPT OVERZICHT

VAN DE

GESCHIEDENIS


kürçê-türkçe

(DUTCH-KURD DICTIONARY)

dörwös terbo

kurdî-târki


(TURKISH-KURD DICTIONARY)



KURDISTAN


QUELQUES NOTES SUR  
LA VIE ECONOMIQUE ET CULTURELLE

TEKOSER  
Union des Travailleurs et Étudiants  
Kurdes en Belgique  
B.P. 6 St. Josse-11  
1030 Bruxelles




LE CAS DU PEUPLE KURDE

LES LIBRAIRES DU CIO-TECO  
31 RUE DE DIXMIEU, 1030 BRUXELLES.  
TÉL: 02/511.45.70.  
Prix : 20 Francs - 15 Francs à partir de 10 exemplaires.



## INFO-BLAD


1983



## INFO-BLAD

1 9 8 4

tijdschrift



## BILAN 1985

périodique



N 3




revue trimestrielle

driemaandelijkse blad

# WÊNEYÊN ZAROKAN





# X E B A T A M E

## 5-14 HEZIRAN

Serdana (ziyaret) bajarê Berlinê ku ji aliyê Commission Européenne Immigrée hati bû pêk anîn. Endamek ji Têkoşer, tevî cuhanine din ên ji netewahiyên (cinsiyet) cihê, besdar bû vê gerra balkêş. Wan gelek cihê remzi dîtin û pêwendîyan bi rêxistinê cihê re kirin. Civîna amadekirina vê çûnê berê hefteyekê li komela Têkoşer çêbû. Me agahdarî li ser Kurdistanê da besdaran, bersivê pirsên wan dan û belgeyan li ser dîrok û çanda kurdî belav kirin.

## 18 HEZIRAN

Pejirandina (qebûlkirin) nijadkujiya (qet-liam) Ermeniyan ji aliyê Parlamanâ Ewropa li Strasburg. Em besdar bûn gotûbêj û biryarstendina parlamenteoran. Piraniya paşveruyan ne hati bûn civînê! Lê, cardin, bi piraniyeke mezin rapora ku li ser vê pirsê ji aliyê parlamenteoran flaman, Jaack Vandemeulebroecke, di 1985 de hati bû pêşkeş kirin, piştî pişkîna (muayene) hemî bendên wê, hat pejirandin.

Li hundirê salonê, nêzîkî 20 nûnerên ermenî besdar bû bûn civînê. Li ber deriyê Parlamanê ji nêzîkî 2.000 Ermenî rawestiya bûn. Piştî stendina biryarê, ew ji şahiyê difiriyan, digiriyan û hevdu himêz dikir. Ji mikrofoneke mezin me stranêr ermenî û axaftinêr nûneran dibihîstin.

## 1 TÎRMEH

Civîneke çapê li ser Kurdistanê, li I.P.C.

(International Press Centre), li Bruxelles (li rûpel 3 binêre). Bi hinceta (munasebet) avêtina bombeyên kîmyawî li ser Kurdistanâ Iraqê, têkdana (xerakirin) gelek bajar û gundêñ wê û sirgûnkirina beşeke mezin ji gelheya wê, ji aliyê hikûmeta Iraqê ya faşîst, Liga Navnetî ya Parastina Maf û Rizgariya Gelan, Têkoşer, K.S.S.E. (liqê Belçika) û Y.X.L.K.E. (liqê Belçika), civîneke çapê pêk anî. Profesor François Rigaux, serokê Lîgê, bi awakî giştî û kûr li ser mafêñ bingehî yêñ tevayiya gelê kurd peyivî. Piştî wî, nûnerên K.S.S.E. û Y.X.L.K.E. nûçeyen nuh û gelek giran ji Kurdistanâ Iraqê dan. Ji derveyî axaftin û bersivdayîna pirsan, me dosyekê, bi fransizî û hollandî pêşkeşî rojnamevanan kir. Gelek rêxistin û şexsiyetên belçîkî piştgi-riya me kir û soz da ku alîkariya me bikin.

## DI MEHE DE CAREKE

- Civînên Kordinasyona Mafêñ Mirov û Gelan (tê de 44 rêxistin hene).
- Civînên Komita Penaberên(multecî) Tirkîyê. Amanca vê komitê parastina mafêñ van penaberan li Belçika ye, û tê de rêxistin û kesen belçîkî, kurd, tirk, ermenî, kildanî, aşûrî û suryanî hene.
- Civînên Mafê Helbijartînen şaredariyî (ên belediyan) ji bo biyaniyan.
- Civînên komelêñ civakî yêñ şaredariya St-Josse.

TEKOSER (Union des Travailleurs et Etudiants Kurdes en Belgique)  
K.S.S.E. (Union des Etudiants du Kurdistan en Europe - Section de Belgique)  
Y.X.L.K.E. (Union des Etudiants et de la Jeunesse du Kurdistan en Europe - Section de Belgique)

Adresse de contact: Têkoşer, 4, rue Bonneels - 1040 Bruxelles. Tel.: 02/230.8930

Bruxelles, le 1.7.1987

## CONFERENCE DE PRESSE: LA SITUATION ACTUELLE AU KURDISTAN

Les derniers événements sanglants au Kurdistan de Turquie ont attiré subitement l'attention des mass-médias européens sur le problème kurde. Malheureusement, ils ont cité les faits hâtivement, en se basant sur les informations données par une agence officielle turque. Cela a donné aux Européens, une fois de plus, une image négative des Kurdes.

Le but de cette conférence de presse n'est pas de commenter ces événements ou d'autres, aussi tragiques, qui se passent quotidiennement dans les autres parties du Kurdistan, mais d'attirer l'attention de l'opinion publique internationale sur le drame que vit le peuple kurde depuis très longtemps, dans l'indifférence quasi totale du monde extérieur.

Le peuple kurde, comme tout peuple, a des droits légitimes et inévitables dont il est privé jusqu'à présent. Nous pouvons les résumer en nous référant à la Déclaration Universelle des Droits des Peuples faite à Alger en Juillet 1976: droit à l'existence, droit à l'autodétermination politique, droits économiques, droit à la culture, droit à l'environnement et aux ressources communes.

Sur le plan international, le droit du Kurdistan à l'indépendance a été reconnu une seule fois: en 1920, la Société des Nations l'avait reconnu au Traité de Sèvres. Mais, en 1922, au Traité de Lausanne, ce droit a été nié, suite à l'opposition d'Ataturk et de l'Angleterre.

Les Kurdes dont le nombre s'élève à environ 20 millions sont, en cette fin du 20ème siècle, la plus grande nation sans état ni droits! Beaucoup de gens se méfient d'eux .../...

# TÊKOŞER'DEN HABERLER

## 5-14 HAZİRAN


Commission Européenne Immigrée örgütü Berlini ziyaret haftası düzenledi. Têkoşer'den bir temsilci, çeşitli milliyetlerden oluşan heyet ile beraber bu geziye katıldı. Gezinin amacı, önemli ve tarihi yerleri görmenin yanı sıra çeşitli örgütlerle ilişkili kurmak ve fikir alışverişinde bulunmak idi. Gezi haftasının planlandığı en son toplantı Têkoşer'in lokalinde olmuştu. Hem toplantıların hem de gezi ve görüşmeler esnasında Kurdistan sorunu ve Kürt göçmenleri hakkında epey bilgi verdik. Sorularına yanıt verdik.

## 18 HAZİRAN

Avrupa Parlementosu'nun Ermeni katliamını tanıma kararı. Parlementerlerin konuya tartışma ve kararlarını izledik. Konservatif ve liberalerin çoğu toplantıya katılmamışlardı. Yine de Flaman parlementer Jaak Vandemeulebroucke'nin 1985'ten beri hazırladığı rapor büyük çoğunlukla kabül edildi. Salonda 20 ye yakın Ermeni temsilcisi bulunmakta idi. Parlamento'nun önünde de 2000 e yakın kişi kararı beklemekte idi. Raporun kabülünden sonra kapı önündeki topluluk tarihi bir öneme sahip bu kararı büyük bir tezahurat kutladı. Kimi ağlıyordu, kimi oynuyordu, kimi de geleceğin özgür günleri için birbirine sarılıyordu. Büyük bir mikrofon ile konuşmalar yapıldı, şarkılar marşlar okundu.

## 1 TEMMUZ

I.P.C. (International Press Centre)



Brüksel'de, Kurdistan'da son gelişmeler hakkında basın konferansı yapıldı. (Sayfa 3e bak). Bilindiği gibi faşist Irak hükümeti Irak Kurdistan'a bir süreden beri kimyevi bombalar atmaktadır. Çoğu şehir ve köy bombardımanlarından dolayı yerle bir edildi. Halk sığın edilmekte. Halkların hak ve özgürlüklerini savunan uluslararası örgüt, Têkoşer, KSSE-Belçika Şubesi ve YXLKE-Belçika Şubesi basın toplantısını beraber düzenlemişlerdi. Örgütün başkanı Prof. François Rigaux, Kürt halkın sorunu hakkında detaylı bir konuşma yaptı. O'nun konuşmasından sonra KSSE ve YXLKE temsilcileri Irak Kurdistan'ndaki son gelişmeleri anlattılar. Konuşmalar ve soruların cevapları haricinde fransızca ve hollandalıca hazırlanmış bir dosya basın mensuplarına dağıtıldı. Önemli sayıda Belçika'lı örgüt ve büyük şahsiyetler bizi bu konferansta destekledi.

## AYDA BİR

- İnsan ve Halkların Haklarını Savunma Koordinasyonu toplantıları. 44 örgüt bu kuruluşu üyedir.
- Türkiye'li Mülteciler Komitesi toplantıları. Komite'nin amacı Belçika'da bulunan mültecilerin haklarını savunmaktır. Komite'de çeşitli kuruluş, Belçika'lı, Kürt, Türk, Ermeni, Kıldani, Asuri ve Süryani'ler bulunmaktadır.
- Göçmenlerin Belediye seçimlerine katılma hakları toplantıları.
- St. Josse belediyesi kültürel örgütleri toplantıları.

★★★  
★ EP ★  
★ PE ★  
★★★

Communautés Européennes  
PARLEMENT EUROPÉEN

**DOCUMENTS DE SEANCE**

Édition en langue française

15 avril 1987

SÉRIE A

DOCUMENT A2-33/87/Partie A

RAPPORT

fait au nom de la commission politique  
sur une solution politique de la question arménienne  
Rapporteur : H. JAAK VANDEMEULEBROUCKE

